

Kurdan tim û tim bi hev re
jiyîneka hevpar avakirinê wisa jî jiyîne
...

»»» R:8



Rêjîma Îranê têk diçe

»»» R:4

Jiyanek kêrhatî bi jinê ve

»»» R:6

Ne xwepêşandan, êdî
serhildan e!

»»» R:7

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (434) 20-11-2022 Buha (1000) Tûmen

GER HÛN PERPERIKEK PIÇÛK BIN JÎ, MÎSYONA WE JI
BALYOZEK ŞER A MEZIN BINIRXTIR E



Mîstefa Hicrî: Xelkê Kurdistanê tevî berdewamkirina serhildana xwe, divê bi hişyarî ve li hember pîlanên rejîmê derkevin

Berpîrsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê “Mîstefa Hicrî”, di peyamekê de rû li xelkê Kurdistanê tevî sersaxîkirin ji malbatên şehîdan û xelkê Kurdistanê, daxwazê dike ku serhildana xwe berdewam bikin û hişyarê pîlanên rejîmê bibin û xwe li dana nîrxên giranbûha biparêzin.

Deqa peyamê wiha ye:

Xelkê azadîxwaz ên Rojhilatê Kurdistanê

Mixabin di çend rojên derbasbûyî de hejmareke berçav ji xortên me yên têkoşer di tekoşîna bajar de şehîd û birîndar bûne. Serhildana nasnamexwazaneya gelê Kurd nîşan daye ku neteweya Kurd li ser îrade û daxwaza xwe ji bo ji holê rakirina şeweyên cur bi cur yên sitem, çewsandin û cudakariyan rijd û tekeziyê dike. Lê di heman demê de divê nîrxên vê serhildanê bîn kêmkin.

Bê guman şehîda ciwanên Kurdistanê tê wateya jidestdana sermayeke binîrx ya Kurdistanê. Eşkere ye ku Komara Îslamî ya Îranê dixwaze raasteraşt arasteya xwenîşandanan bixapîne. Lewma divê xelkê Kurdistanê bi hişyarî ve li hember pîlanên rejîmê û dijberên gelê Kurd reftar bikin.

Eger çî tevahiya neteweya Kurd û azadîxwazên Îranê bi şehîdbûna xwe ya ji bo maf û azadiyên gel serbilind in, lê di vê qonaxê de parastina canê xelkê Kurdistanê û têkoşerên me yên fedakar divê girîng be. Bi taybetî ez daxwazê li ciwanên me yên leheng dikim ku bi şeweyekî vê serhildanê berdewam bikin ku kêmîrîn nîrxa canî hebe.



Di dawiyê de ez bi navê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê sersaxiyê dibêjime malbatên şehîdan û hemû xelkê Kurdistanê û hêvîdar im ku birîna hemû birîndaran baş bibe. Daxwaza kevnar a Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê û hemû şoreşgerên Rojhilatê Kurdistanê, bidestdîstina serwerî û rizgarî û bidestdveanîna mafê neteweyîya Kurd di vê pêxemê de ye, her lewma jî têkoşîna me ya rewa dê berdewam be.

Rojhilatê Kurdistanê di serkevtina xebata xwe de alxahîn e.

Berpîrsê Navenda Birêveberiya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Mîstefa Hicrî

29ê Xezelwera 1401an a Rojî

20ê Çiriya Paşîn a 2022an

Kovan Amedî: “Gelê kurdistanê naxwaz e ta ebed bindest bijî, jiyanek azad û bextewar divê”



**Kovan Amedî
Serokê Federasyona
Komeleyên Kurdistan
li Swêd**

Me digel Serokê Federasyona Komeleyên Kurdistan li Swêd rêzdar Kovan Amedî hevpeyvîn pêk anî û navbirî got: “Gelê kurdistanê naxwaz e ta ebed bindest bijî, jiyanek azad û bextewar divê”.

Hevpeyvîn Hesên Mukerem

P: Rêzdar Kovan Amedî hûn serhildana jinê li şoreşa Rojhilatê Kurdistanê çawa dinnirxînin?

B: Ev serhildana, ne razîbûn li dijî zulum û zordestîya rejîma Îranê ye. Ev serhildana li dijî binpêkirina hemû mafên demokratîk û mirovîyê ye. Gelê kurdistanê naxwaz e ta ebed bindest bijî, jiyanek azad û bextewar divê.

Dikarim bêjim piştî ruxandina rejîma Şah, mezintirîn û firehtirîn serhildana sîvîl û gelerî ye. Zulum û zordestîya li ser gelê kurd û li ser hemû gelanên Îranê, hatiye wê radeyê ku êdî tehamula xelkê ji zulma rejîmê re nema ye. Di Kurdistanê Rojhilat de nerazîbûna xelkê ji kiryarên çil salên dawî ya rejîmê re wek Volkanek di dilê wan de tomar bûye. Şehîdbûna Jîna Emînî, bû çirîskek û bi volkanê ve ket. Volkana serhildanê, volkana eşqa azadiyê bi taybet ya di dilê kurdan û bi giştî jî ya gelên Îranê teqîya. Îro xelk, ji bo bi destxistina mafên xwe yên rewa diherikin kuçe û kolanan.

Xelkê kurdistanê li jêr druşma “JIN JÎYAN AZADÎ” de li dijî rejîma Îslamî ya Îranê serî hilda ye. Divê em fikir li wê bikin ku serhildan, di serdema mediya ya civakî ya digital û teknolojiya

pêşveçûyî de çê dibe. Lewra jî çirîskên xwe zû avête Belûcîstan û Azarbeycanê û li seranserê Îranê belav bû ye. Dengvedanek mezin jî li Cîhanê peydakirîye. Pêwîst e bêjim ku xelk li Kurdistan û li tevayî ya Îranê, bi druşmên demokratîk û bi heştîyarî û pir bi aqilane, serhildanê bê weştan didomînin.

P: Rêzdar Kovan Amedî hûn gotinên rayedarên Yekîtiya Ewropayê û Amerîka ku berdewam behsa piştevanî ji serhildana Îranê dikin çawa dinnirxînin?

B: Yekîtiya Ewropa û Amerîka, hişyarî daye Îranê. Du hefte berê civîna YE yê biryar girt ku Îranê bixine nav bazina aborî û firotina çekan. Li gor serokê Hizbullah Lubnanê Neîm Qasimî, ku Amerîka berî çend rojan erîşê li karvanek (konvoja) sûtemeniyê ya Îranê ku ber bi Lubnanê ve diçû kiriye û zêdetir 350 milyon dolar zerar daye Îranê. Evana hengavên girîng in. Lê ne bes e. Li gor raya min Ewropa û Amerîka, ji rejîma Îslamî ya Îranê ne razîne û dixwazin guhartinek çê be. Lê li firehbûn û geşbûna serhildanê dinêrin. Yên ku şoreşê bikin gelanên Îranê ye. Hetta ku piştraşt nebin ku rejîma Îranê yê çûyîne ye, wê tim berjevendiya xwe yê navdewletî li ber çavan bigrin. Di vê rewşê de yekîtiya hevkarîya hêzên Kurdistanî bûyerek esas û serekî ye. Lê, wek min li jor jî anîbû ser ziman, ev serhildana dengvedanek mezin di medyaya Ewropî û Amerîkî de çê kirîye. Di nav partiyên siyasî yê Ewropî û di nav xelkên sîvîl de jî dengên dijberên Rejîma Komara Îslamî, bilind dibe.

P: Gelo rewşa Kurd di vê serhildanê de çawa dibînin?

B: Bi giştî rewşa xelkê ne baş e. bi taybetî jî rewşa aborî û civakî ya kurdan ku li bajaran jiyanên xwe didomînin, ne baş e. Lê, divê em ji bîr nekin ku kurd tu caran ji bîrsan nemirine.



Birsîtî xerab e. Lê, jiyan bindestî ji bîrsîtîyê xerabtir e. Xelk bîrsîyê azadiyê ye. Azadiya xwe ji hemû tiştî girîngtir û bi rûmettir dibînin.

Divê hesabek muşterk hebe, NAVEND a Hevkariya Rêxistinên Kurdistanê Rojhilat, dikare di vî warî de gavek bavêje. Her usa, divê kurdên hemû beşên Kurdistanê û bi taybetî jî kurdên diasporayê, di warên aborî de jî bibin pişt û pal bo Rojhilata Kurdistanê.

P: Rêzdar Kovan nerîna we li barê dengdana 227 nûnerên meclîsa rejîmê bo bidarvekirina xwenîşanderên binçavkirî de çîye?

B: Li gor rapora NY, ji nêvî zêdetir girtiyên ku di zindanan Îranê da ne, kurd in. Metirsiyek mezin heye li ser girtiyên siyasî, bi taybetî jî kesên ku di pêvajoya rapêrînê de hatine girtin. Rejîma mellayan, dikare ji ber raya giştî ya Cîhanê, şiklê kuştina muxalifên xwe bigorîne. Ango wek salên 1990'î de ku rejîma Tirkîyê, girtiyên siyasî li jêr îşkenceyan de dikuştin û bi dizî vedişêrandin. Yan jî qeyda wan li girtîgehê çê nedikirin, malbatên girtiyên ji girtina kesên xwe ne dihatin agahdar kirin. Wan girtiyên siyasî dikuştin û di şûnek ne diyar de vedişartin. Ez bi xwe, bi şikim ku rejîma Komara Îslamî ya Îranê jî vê yekê dikin.

Gelek girîng e ku xwepêşandarên kurd û neteweyên din, di kuçe û kolanan de, bi daxwaz û diruşmên xwe ve, serinc bikşînin ser

rewşa girtiyên siyasî. Her usa jî, kurdên diasporayê û partiyên Kurdistanî jî, di meş û xwepêşandanên ku bo piştgiriya Kurdistanê Rojhilat li dardixin, di daxuyaniyên xwe de îşaret bi rewşa girtiyên jî bikin. Daxwaz ji NY bikin ku li ser rewşa girtiyên bi taybet mijûl bin.

P: Rêzdar Kovan Amedî di vê dawiyê de dibînin ku keç û jinên Kurd sirûd û siloganan di mizgevtan de li ser binlengoyan belav dikin ev yek bandorek hebibe li ser morala serhildaran an na?

B: Ez hemû cure, xebatên demokratîk rast dibînin. Mizgeft, Dêr û Zanko, piştgiriya kesayetiyan ayînî, xwendevan û karker'an gelek grîng in. Ji xwe taybetmendiya vê rapêrînê jî ew e ku ji hemû kategoriyan civatê pêra ye. Ev yeka gelek grînge ku xwepêşandaran heta nuha metodên şiddetê bi kar ne anîn in. Rapêrîn, bi metodên demokratîk ve birêve diçe. Mizgeft, mala Xwedê ye. Keç û jinên kurd xwe avêtbin mala Xwedê û ji mala Xwedê, ji bo jiyanek demokratîk, azad û yeksan, bi bilindgoyên mizgeftan dengên xwe radigihînin xelê, karek baş û aqilane ye. Her karekî baş û serkeftî, moral dide xelkê û agirê şoreşê di dilê wan geştir dike.

**Kovan Amedî
Serokê Federasyona
Komeleyên Kurdistan
li Swêd**

Rêjîma Îranê têk diçe



N: Azad Kurdî

Bi destpêkirina şorişa JÎNA, piştî 43 salan desthilatdariya reş û zalimane, êdî bi îradeya gelên Îranê û pêşengiya Rojhilatê Kurdistanê, dawî bi desthilatdariya xedar a rêjîma Komara Îslamî ya Îranê tê.

Tilism û taboya ku rêjîma Îranê bi afiradinê teror û terorîstperwerî, îdamkirin, îşkence, girtin û çavtirsandinê li ser civaka Îranê bi giştî 43 sal bûn pêk anîbû, aqîbet bi dawî hat û peyker û pêkhateya rêjîmê têk çû û ya ku wan qet jê bawer nedikiri weke şorişa JÎNA dê raştî nefreta hemû civaka Îranê bi yekdemî bibin. Her tişt bi şehîdkirina keça Kurd JÎNA li bajarê Tehranê dest pê kir û ev 60 roj zêdetir in roj bi roj xebat û serhildan bona rûxandina vê rêjîmê bi berfirehî diçe pêş. Belkî di heftiya yekemîn da, zêde xwenîşandan û meşên nerazîbûnê hebûn, lê bi hêvî û îradeya ku gelên Îranê bideşt

xistin bi pêşnegiya bajarên Kurdistanê, êdî ji heftiya duyem pê de çalakiyan rengê serhildanê bi xwe ve girtin. Serhildanê hemû bajarên Îranê bi kêmkî û zêde bi xwe ve girtin. Civaka navdewletî bi vê îrade û serhildana gelên Îranê matmayî maye û bûye mijara sereke ya medya û dîplomasiyê. Piştigirî ji serhildanên gelên Îranê her diçe zêdetir dibin.

Bo gellek kesan ku ji dût ve rojeva Îranê dişopînin, pirseke berçav hatiye pêş ku çawa ji nişkê ve Îran di navxwe de wiha aloz bû û xwenîşandan ber bi serhildanê çûn ?

Bersiva vê pirsê pirr xuya û zelal e. Rêjîma Îslamî ya Îranê rêjîmeke dîktator û tepeserker e û bi fêlbazî û derewan hewil dida ku bi civaka cîhanî nîşan buide ku gelên Îranê ji vê rêjîmê razî ne û piştevanîyê ji vê rejîmê dikin.

Lê bi kiryar ev yek di asta navxwe de sedî sed berevaj bû. 43 sal bû ku rêjîmê hewil dida ku bi afirandina tirs û xofê, kuştin, îdamkirin û tund û tûjiyan pêkhateyên civaka Îranê kontrol bike û desthilatdariya xwe ya gemar û gendel û diz bidomîn. Belkî rêjîma Îranê di salên borî de



karîbe di asta navdewletî û herêmî hinek deskevtan bideşt bîne ew jî bi dayîna îmtiyaz û rêkevtinan ligel çendîn welatan, lê berevajî hemû wan hewildanan, rêjîm mêtîsal bû di asta navxwe de raştî têkçûnê hatibû, lê bi dara zorê û qirkirin û bêdnegkirinê diveşart.

Civaka Îranê weke bombeke atomê teqiya û hemû cîhan matmayî kir !

Di asta aborî, siyasî, civakî de zext evqas xurt û berfireh bûn ku ev teqîna civakê hêdî hêdî xuya dikir. Helbet amabargoyên dîrokî û berfireh ên rêveberiya Traump li ser rêjîmê bê bandor nebûn li ser vê rewşê di asta navxwe de. Êdî vê carê îradeya gelên Îranê zindî bûye û rêjîma Îranê bi vê serhildanê ligel nerewayî û têkçûneke mezin rûbirû bû.

Rêjîma hov a Îranê rojên dawî yê desthilatdariya xwe ya xedar derbas dike û ji xeynî çekên kuştin, girtin û îşkenceyan çî rêçareyeke din nas nake, êdî tirs û xof bêtewate bûye bo gelên Îranê û nirxa azadiyê bi xwîna keç û lawên xwe didin bona jiyanêke bi rûmet û azadiyên demokratîk û xilasbûn ji darê

Dr. Serbest Nebî got: “Gotara siyasî û silogana diyarîkirî wek em dibînin taybet bi demokrasiyê ye taybet bi roxandian rejîmek tundajo û dîktator e.”



Dr. Serbest Nebî
Mamoşeyê felsefeya siyasî li Zanîngeha Koye

Me digel Dr. Serbest Nebî li derheq serhildana Rojhilatê hevpeyvîn pêk anîn navbirî got: “Gotara siyasî û silogana diyarîkirî wek em dibînin taybet bi demokrasiyê ye taybet bi roxandian rejîmek tundajo û dîktator

e.

P: Bi nerîna we ev dor-pêçên welatên Ewropa û Amerîka yê li ser rejîma Îslamî ya Îranê bandorek li ser rejîmê û pêwendiyên di navbera wan yê li derheq Lihevkirina navkî heye?

B: Sebaret bi pîrîsa te ya yekem ew du deşten Amerîka û Ewropa, li acendeyên wan de nîne ku guherîn li rejîma Îranê de bikin di vê qonaxê de, her wekî dibêjin me tenê divê Îran reftarên xwe biguhere li reftara xwe di çî astê de biguhere, li astê derve û li astê navxwe bo wan xem nîne, eger rejîma Xamineyî

xelkê bikuje û birîndar bike, ew ne xemxwarê vê ne, xemxwarê vê yekê ne ku ecindeyên wan lio Lubnan, li Îraq li Sûriye, li Yemen ewane têk didê, ew gorankariya ku ew daxwaz dikin gorankarî li reftarên xwe an bibêjin te'îdîlîkirin an guncavkirina reftarên xwe li asta navxweî nîne belkî daxwaz guherîn li asta derekî ye, ewa xema yekem a Ewropayê û ya Amerîkayê ye, Amerîka niha di vê gonaxê de naxwaze rejîma Xamineyî an Xumeynî damezirqandî biguhere, lê diyare bi du deşteyan dike deştê raşt goftogoyê digel bike û hewlê dide tenezulatan(Poenan) ji

wan biştîne sebaret bi wan mûşekên navkî hewl dide rejîma Îranê bersivê bide li ser pêdawiştîyên siyasî û civakî ya Ewropî û Amerîkî, û bi deştê çepê jî hewlê dide hindêk tenezulatan anê wek mînak nûnerên Yekîtiya Ewropayê li Parlemana Ewropayê, nûnerên Opozisiyona Îranî bi tevahî dîtine û guhdariya gotinên wan dike, lê ewane di raştîyê de ti karlêkeriyek li ser siyaseta wan dewletan tinîne, ewane tenê dibêjne Îranê em agehdar in tu çî dikî, em egehdar in tu çende tundûtîjî li hember xelkê li ser şeqaman û li dijî vê raperînê bi kar tîni, em jî

»»»Dom R:5

»»»Doma R:4

dikarê vê bi kar bînin ca ya baştir ev e tu tenezulata bo me pêşkêş bikî tu li melefên li ecindeyên naqvkî mûşekî û yên wiha û melefên jêosiyasî li Yemen û Lubnan û Sûriyê û Îraqê tenezulata bo me bikî, ew şewaza siyaset a oportoniştan(Derfetçiyân) e, çewazên ku ewropî bi kar tînin di vê qonaxê de taybet bo rejîma Îranê ye, bi hizra min ew şoreşa paş nakeve, ew raperîna ku di Îranê de ye, cudaye ji hemû raperîn û xwenîşandanên nerizayetiyê li salên derbasbûyî, ev cudaye û bi tevahî serhildanek bi wateya tevaw û em dikarîn berfirehtir ji li ser biaxivin di qonaxa dyemê de.

P: Dr. serhildana niha ya Rojhilatê di çi qonaxekê de ye?

B: Sebaret bi pirsê duyem wekî min bas kir, ew raperîn e yanê şoreşek bi tevawî wate ye, yekem tişt, cadeya Îranî bi hemû netewên Îranî tawanî heta niha yek gotarek siyasî diyar bikin. Gotara siyasî û silogana diyarîkirî wek em dibînin taybet bi demokrasiyê ye taybet bi roxandian rejîmek tundajo û dîktator e. Heta niha ti xweşt û daxwaziyeke siyasî derveyî gotara hevpar bilind û berz nekirine lê tirs heye tirs ji hezîfê me wekî me wekî ezmûna Sûriyê ku me dît destîdirêjî tede bê, destîdirêjiya çekdarî yanê bi leşkerîkirîna vê şoreşê ye ku ew xeterek gelek mezin e li ser paşeroj û dawatûyê be, regeh rejîma Xamineyî bi xwe hin girûpên çekdar tevî serhildana xelkê bike ku bikarin bibêjin ew tundrev in ew çekdar in ew ne şoreşek demokratîk e, divê hemû ji vê yekê agehdar bibin û rê bi wan nedin ku wekî Sûriyê de qewimî û di nav xwe de dabeş dabeş bû, tirsê duyem a li ser wê dikarim bibêjim ku ew tirsek asayî ye heta niha ti pilatformeke taybet a vê çoreşê nîne yanê nûneratiyek hevbeş nehatiye damezirand ji gişt opozîsiyona neteweyên Îranê, dibe vê şoreşê pilatformek ytaybet hebe, eger wiha berdewam be dê bi hed bê sînor derkeve û dê bibe raporînên lokal, lew-

ma heta niha ew tişt nebûye, em dibînin ku barê herî giran û qurs li ser milê Kurdistanê rojhilat û xelkê Kurdistanê ye, ewa dê zêdetirîn qurbanî didin derece yek û raperîna wan tundtir e û bihêztir e û herwisa piştevanîyek Belûçan jî heye tirsê sêyem ji ew ku hokar an sedemek heye ew ya derve ye, tirsê min heye destê Tirkîyê an destek Tirkîyê destêverdanê bike her wek di Sûriyê de ku û hin girûpln Tirkeman jî herwisa li rojhilatê Kurdistanê de bike û Azeriyan û Kurdan bi dijî hev bi kar bîne, û tirsê tirkîyê tisek mezin e nû gorankariyek demokratîk li Îranê biqewime, hêzên Rojhilatê Kurdistanê bi taybet agehdarê vê xalê bin, tekeziyê dikim ku bi micidî agehdarê vê xalê bin, dewleta Tirk aqilê siyasîyê tirkî ji Rojhilatê Kurdistanê ditirse herwek çawa ji bakûrê Kurdistanê ditirse çi gorankariyek li Rojhilatê Kurdistanê biqewime bo berjewendîya be bo paşeroja dewleta Tirk metirsî ye ji nûtûraniyîya Tirk û eqlê siyasîya Tûranî, regezperestiya ku li tirkîyê heye, ne wekî Rojava ku xetera wê kêmtir e li ser Tirkîyê, serwe jî dibînin ku tirkîye di wan deh dazdesalan de çi bi kar anî li dijî ecênda û armancên Kurd li rojavayê Kurdistanê, ew her sê xalên girîng in bo vê şûreşê, li ber vê yekê pêwîste Kurd li Rojhilatê Kurdistanê gotarek siyasî eqlanî di hember Azeriyan dabirêjin ku Azerî ne neteweyek tirk in lê raşte zimanê wan tirkî ye û divê tezîza wan û fûkûsa wan rakêşîne bo ser vê yekê ku Kurd û Azerî nêzîkî hev in û dîroka û cografîya wan gelek nêzîkî hev in wekî demokrasiyek modern welatek pêşkevî bi hev re damezirînin û jiyanek baştir û civantir damezirînin. Ez hizir diki ku eger eqlê regezperesî û Tûranî bikeve nav xelkê Azerî dê zêyanek bo wan û ziyaneke bo Kurd û paşeroja Îranê hebe.

P: Gelo ev piştevaniya Amerîka û welatên Ewropayî ji serhildêran, mirov dikare bibêje derbeyek mezine li rejîma Îslamî ya Îranê?

B: Sebaret bi pirsê sêyem piştgirîya Amerîka û Ewropa bo Rojhilatê heta niha piştgirîyek me'newî ye, heta niha li asta pratîk an emelî de cî be cî nebûye, lewma dibê Amerîka jî vê yekê pêştir here hêj kargêriya simbola vê şoreşê anku jin jiyan azadî li raya giştî ya ewropa ya Amerîka û cîhanê de dengvedanek mezin daye û hetmen jî wiha namîne û di rojên bê de dê karlêkeriyê li ser biryarên Ewropayî û Amerîkayê bide lê her wekî min pêştir di bersivdana yekem de bas kir, bi du destan pêwendî digel Îranê dike bi destê rastê goftugû dike ku tenezulatan bi dest bixe bo berjewendiyên siyasîyên ewropayî û Amerîkayê û bi destê çep hewlê dide tekeziyê li ser bike û zêdetir tenezulatan bi dest bîne taybet bi vê acendaya siyasî ne bo daxwaziyeke xelkê Îranê û neteweyên Îranê.

P: Gelo mirov dikare bibêje di vê pêvajoyê de xetîreya şoreşê li destê jinê de ye?

B: ez wiha nabînim, ew pirs ji min hate kirin li ser mîdiyayên erebî jî û beravird kir digel şoreşa Sûriyê şikest û bû şerê navxwe, li ber gotar û amêrên mîrsalarî ên şoreşê bi kar dihat lewma bo aştê dakîkal ve çû û hêzên tûndrew hatin pêşîya vê raperîna Sûriyê û cih dagîr kirin, karîn zimanê xelkê bidizin û bi navê wan û bi gotarek Îslamî-Siyasî biaxivin û bi kar bînin, li ber wana civaka navnetewî piştevanîkirina xwe ji şoreşa xelkê Sûriyê ragirt û paşve çûn, em dibînin ku ew raperîna(serhildan li Rojhilatê Kurdistan û Îranê) raperînek bê mînak û cuda ye taybet bi jin e çoreşê materyalîstî ye bi navê tev gel û neteweyên Îranê û raşte ku di destpêkê de jina Kurd ew serhildan dest pêkirin û di hjer demê de bawerî bi jina Kurd hebûye, jina Kurd her dem kariye gotarek modern û demokratîk pêşkêş bike, li Rojavayê Kurdistanê jî me ew yek dît û li Rojhilat jî em dibînin ku ew dubare bûye û da xuya ku jina kurd cuda ye ji jinên tene nasîn li ser jinên Rojhi-

lat, ew têbîniya ku Ewropî û Amerîkayîyan li ser jinan li Rojhilatê navîn de hebû, bi jina Kurd hate guhertin, jina Kurd mînakek nû ji zayend û regez pêşkêş kiriye li li ti metkeb û felsefeta siyasî de nebûye lewma bawer dikim rehend li ser jin be li ser jinên Îranê û bi taybet li ser jinên Rojhilatê Kurdistanê ew serhildane dê armancên xwe cî bi cî bike û gelek bawerî bi wan heye. Ew nezanin ku ezmûn an ceribandîna êî Lîbî, Sûriye û çoreşên beharên Erebi nikare bersivê bi de klu heta ti aştê ew çoreş û serhildana li Rojhilatê Kurdistan û Îranê, hinde bê mînak, pêşkevî û' cuda bû, lewma ez bi xwe wa gelek miştaq bûm gelek keyfxweşbûm ku jin bi taybet jina Kurd hinde aza û netirs û bivêr in ku karine pêşengiya serhildanê bikin

P: Gelo rejîma Îslamî bi wan hemû îşkence û kuştin û rewandin û tudûtîja li hember serhildêran, dikare xwe ji vê heqîqeta ku heyî nedîtî ve bê?

B: Ev pirsîyar ji midyayên erebî û cîhanî jî ji min hate kirin, gelo! Rejîma Îranê dikare çaksazî û reforman bike û hinek tenazulatan(Poenan) bi xelkê re bide, ez du-sê sal in min xetbat li ser gotara netwî û hizriya Wilayeta feqîh û destûriya Îranê kiriye wek ez dibînim, ew rejîme bi ti awayekê amade nîne ku ti9 tenezulatekê bo xelkê Îranê an reformekê di binyat û rejîma xwe de çê bike. Binyata vê rejîma totalîter û tevavxwaz wiha hatiye avakirin, lewma ez bawer nakim ku ew hizrên wiha bikin, bi hizra rejîmê ku eger tenezulatek biçîk jî bike derzek mezin di dîwarê daktaroriyê de dikeve lewma bi vê hizrê nikare ti yenezulatekê bo xelkê bike an têngihîştinek ji rewçê hebe û reforman digel neteweyên li Îranê pêk bîne, lewma xelkê Rojhilatê Kurdistan û neteweyên din ên Îranê neçar in vê raperîna bidomînin heta bikarin serkevtinê bi dest bixin, zor spas

Dr. Serbest Nebî Mamosteyê Felsefeya siyasî li zanîngeha Koye

Jiyanek kêrhatî bi jinê ve



N: Vênûs Fayîq
W: Hesên Mukerem

Eger beraxwe bidin bi dîroka neteweyên li ser rûyê erdê yên hatinî çewsandin, hertim xebateke wan ya veşartî jî di beşên din yên xebata siyasî û tevgerên cemawerî de ku hertim mêran rêberatiya wan kiriye he ye, ev jî amadebûna jinê di nav her arîşeyên siyasî yên civakê de ku kêmtirîn rêz jê hatiye girtin û gelek kêmbêhs jê hatiye kirin. Ev piştguhxiştina jinê di wan waran de û hinek kêmxemiya vê berjinê dikeve ku, weke pêvekê mêrê di nav rêzên duma-hiyê de di bin siyê de xebat birêve biriye an ne rasteraşt, încê li tirsê civakê bibe an li tirsê mêrê nêzî xwe ku bi awayeke veşartî li ser navê xwazyar çalakî encam dane.

Di vê destpêkê de mebesta min jî meselê “xwe bi kêmxanîna” jinê di warên siyasî û xebata siyasî û tekoşîna li dijî dagîrker û dijminê neteweyên bin dest e tundtir dibe. Çimkî bi hemû şiroveyan û pêveran ti jî destkevtên mêr li şoreşan de ku bideşt xistîne nebûye û dîr li amadebûna çalakane ya jinê di jiyana wan de, nebûye eger wan bixwe jî bawerî bi vê heqîqetê tunebin an dan bi vî mafî nedin. Xebatkirina bi tenê û havê-tina çekê bi milê xwe û singê xwe dan ber gulleyên dijmin kurt nabe. Belkû eger hin jin nebana ku di malê de rola kara ya bav û bira û mêrên xwedî zarok negirtiban bi stûyê xwe, mêran herwisa bi hêsanî rêya xebatê nedidan berahîka xwe. Bi sedan jin bi awayeke çalakane xebata binerd û veşartî encam dane û alîkarê mêran bûne, lê, niha dîrok behsa wan nake, ev bi vê wateyê nine ku amadebûna wan sist bûye, belkû bi

wateya vê yekê ku ev dîroka daxiştî ya mêran ku dinvî-sin û mêr qala vê dîkin û pê şanaziyê dîkin her mêr jî ku xwe bi xwediyê vê dizanin.

Demaku dibêjim jin bixwe kêmtir xeme di vî warî de ku dîrokê druşt bike, mebesta min ev ye ku di vî jîrî de bi vê hindê qina`etê neyîne û nebe beşek li vê dîrokê an di peravêzê de navê wê bînin.

Eva ye nêzîktirîn mînak me şoreşa gelên Îranê ye ku jin çî roleke bandordar tevdigere, helbet rewş û serdem di eniyên coda de û bi sedema teknolojîyê hemû tomarkiriyê û dîroka bîmîne ku yekemîn biroska vê şoreşê li ser destê jinê gur girt, jinên Îranê bi hemû neteweyên wir bitaybet neteweya Kurd jî seranserê cîhanê re da selmandin ku di şiyana wan de heye ku şoreşê hildin û pêgeha desthilateke dîktator bihejin.

Îro ku hinek kes jinên Îranê rexe dîkin ku serpeçatî û xavikên xwe dihavêjin, jî vê yekê fêhmî nakin ku ev yekê tewav helwesteke siyasî ye û amûreke bo dijayetîkirin digel desthilateke dîktator bi armanca standina maf û azadî û bitaybet azadiya laş û xwedîderketin jî wî laşî ye ku tenê jin bixwe xwediyê wê ye.

Tevgera jinên Îranê ku destpêka sedsalên 20`î de di bin siya desthilata Reza Şa de li guherînkariyên siyasî û civakî yên wî serdemî vegeşîya û piştî jî tevgera jinan piştî şoreşa Îslamî di wî welatî de her berdewamkerê heman



xebatê ye, lê, yaku gur daye bi vê xebatê rêkara yasayî ya tundrewên Komara Îslamî li hember jinê ye ku daye berahîka xwe.

Herçend ku di niha de, du rêbaz bi eşkere di xebata jinan de li Îranê texmîn bo wan tê kirin ku yekemîyan tevgera jinên Îslamî ye ku bawerîyan wan bi çaksaziya yasayî û civakî di çarçoveya ol û şerî`ietê de he ye, wan bawerî bi vê hene ku şerî`iet rê dide bi guherînkariyê û jî nû ve xwandin û şirovekirina deqên Qora`anê bi awayekê digel riha serdemê bigonce.

Ya duyem jinên îlmanî ku tenê bawerî bi mafên mirov û mafê medenî yên jinan û wekheviyê li pêxema hemû waran de hene, bi armanca rizgarkirina jinê di wan peravêzên ku bi sedema serdestiya olê ye û jin li destê vê de dinale û jî hebûna îradeyê xistiye û stû xwarê nîv jiniyeke kêrhatî bo însan dike. Û vê rêbazê jî hewla tund bo dîr xistîna olê li dewletê û jiyane bitaybet takên civakê didin û daxwaza darêtina bingehe perwerde û felsefeyê perwerde dike û armanca bideştixistina wekheviyê di navbera keç û xortan de bibe û jin tevî hemû warên civakê be û mil bi milê mêr bi bî hebûna ti cudahiyeke zayendî.

Dawîn car hîcaba bizorê di Îranê de bi mebest sînûrdarkirina hereketên jinan û sînûrdanin bo çalakîyan di warên civakî de bitaybet di nav hikûmet û desthilatê de ye, heta digihîje bi standina mafê xwawendarîtiya laşê wan di warê giştî de. Lê, digel vê de jî, ev şoreşa ku di Îranê de û di niha de li gorê de ye, mebesta sereke derxistina zirxî û xavikê nine, belkû havê-tin û şewtandina xavikê semboleke zelale weke çavê rojê bo bideştixistina jiyaneke kêrhatî bi însan bo jinan e.



Nerîna Lîderan



“Zalmay Xelîlîzadê”

Hikûmeta Îranê piştigirîya xwe ya navxweyî ji deşt daye




“Emmanuel Macron”:

Îran asayîşa navçeyê têk dide



“James Cleverley”:

Deştilatdarên Îranê xwînrijandin û wêranyê belav dikin



“Gulamhisên Şaffî”:

Qedexekirina înternetê gefê li jiyana 9 milyon kesî dixwe

Ne xwepêşandan, êdî serhildan e!



N: Eskender Ceiferî

Xwepêşandanên wê dawiyê yên li dijî rejîmê jî weke cejna netewî ya Newrozê bûne remza şoreşê. Lê belê niha êdî piştî çend heyvan, ew ne xwepêşandan in; êdî ew serhildan e li dijî rejîma faşîstên Tehranê.

Heya niha zêdetirî 80 serhildar li Kurdistanê hatine şehîdkirin, lê tevî wê jî serhildêr dev ji xwestekên xwe ji bo guhertina rejîmê bernadîn.

Di dîroka hevçerx de, ti yek ji wan deştilatan ku Kurdistan dagir kirine, nexwastine lihevciyîna Kurdan bi rengekî ciddî were pêşwazîkirin. Rojhilatê Kurdistanê jî parek ji vî welatê birîndar e. Komara Îslamî, weke rejîma Pehlewî, riftarê bi Kurdan re dike û lehengên Kurdan tenê ji ber pêkanîna çalakiyekê bi dehan salan di girtîgehan de dimînin.

Aliyên siyasî ên Rojhilat, herî dawî li ser xwepêşandanên girseyî ji bo şermezarkirina şehîdkirina Jîna Emînî lihev hatin. Belkî ev, zengila metirsiyê be ji Komara Îslamî re. Ji Ber ku heya niha ti caran bi vî rengî, hemû partiyên nasyonalîst û komonîst ên Rojhilatê Kurdistanê li hev nêzîk nebibûn. Tevî ku rejîmê bajar û navçeyên Kurdistanê mîlîtarîze kirine, lê dîsa jî serhildan her didome.

Rejîma Komara Îslamî ya Îranê, tevgera partiyên Rojhilatê Kurdistanê bi hûrî dişopîne. Heta partiyê Kurdî bikare hevrêziyê di nava refên aliyên cuda de pêk bîne, Komara Îslamî jî nîgeran e.

Piştî biryara han a pêşwaziya meşên şermezarkirina şehîdkirina Jîna ji aliyê



partiyên Kurdî ve, tevgerê mezin di nava Spaha Pasdarên Îranê de çê bûye. Ew ditirsîn wê carê Rojhilatê Kurdistanê hemû hevdeng rabe ser piyan. Zanyariyên veşartî ji nava Spahê amaje dikin ku bajarên Sine, Ormiye û Kirmaşanê bûne armanca sereke a hêzên wê rêxistina terorîst. Bi vî rengî ku endamên Sipahê, di nava xelkê sivîl de digerin û neyaran didin nasandin û biryar e her kesê ku behsa xwepêşandanê hevpar a aliyên Kurdî bike, bê girtin. Ji xwe heya niha dehan kes jî hatine kuştin û sedan kes hatine girtin.

Ji xeynî tevgerên Spaha Pasdaran, selefî jî li hemberî nasyonalîstan tene çalakkirin. Plana herî dawî ya Îranê ew e ku derfetê bide rêxistinên tundrew da ku nasyonalîzma Kurdî di landikê de bife-tîsin. Li gora zanyariyên çavkaniyê veşartî a saziya Îstixbarat angû Îtîlaata Îranê, heger tevlihevî an jî serhildana xelkê û partiyên Rojhilat li hemberî deştilat çê be, dibe ku ji bo dijatiya hêza Kurdan, mifah ji aliyên selefî jî were wergirtin.

Her sal, hejmara kesên ku li Rojhilatê Kurdistanê di encama nebûna derfetên kar de dibin kolber, bilind dibe. Rêjeya kuştina kolberan, girtina Kurdan bi tometên siyasî û herwisa rêjeya darvekirina welatiyan zêde dibe. Tepisandina xelkê berfirehtir dibe lê dîsa jî xelk guh nade rejîmê. Her sal qedexetî dikeve ser pêkanîna rêwresma Newrozê lê tevî wê jî xelk cejna xwe pêk tîne û slogana partiyên xwe li dijî dîktator, hildide. Her rabûnek, ji bo Kurdan referandûmeke serxwebûnê

ye ku li dijî Tehranê li hemû navçe, gund û bajarên pêk tî. Aliyên siyasî ên Rojhilatê Kurdistanê wisa dibînin ku qet li Îrana di bin deştilata Komara Îslamî de, hilbijartineke demokratîk û azad birêve neçûye û ew hertim hilbijartinê baykot dikin. Li gor wan, her sal Kurd di nerazîtiyên xwe de li hemberî rejîmê, biryara xwe li dijî dagirker diştînin û soza xwe bi riya şehîd û cangoriyên niştîman re nû dikin. Niha, referandûma serxwebûna Rojhilatê Kurdistanê, ji aliyê tevahiya partiyên di nav Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê ya Îranê ve bi rêve diçe. Her yek ji wan, sloganekê ji bo azadiya niştîman hil dide. Taktîk jî cuda ne. Lê armanca hevpar, bûye sedem da ku hemû, hevdeng, bang li neteweya Kurd bikin heya dakevin kolan û dilê dagirker bihejînin û car din jê re bêjin ku evder welatê me ye û em ji bo pêkanîna tevgeran li ser axa xwe, îznê ji ti kesekî naxwazin û rabûna me, dengê dijatiya me a li hemberî dagirker e.

Êdî çiyayên Zagrosê, hemûyan deşt dane hev û ji Agirî, heya Bozê Sîna, ji Kêleşin heya Arbaba û ji Dalaho heya Qelaçolan, dengê pêşmerge di nav keç û xortên Kurd de reng vedide û ewê bi tîrêjên agir û rojê û bi qêrînen dilên dayîkên şehîdan herin pêşwaziya xwepêşanderan û zêdebarî hemû rêwşûnên tund ên

ewlehî ji aliyê rejîmê ve, nêzîkatiya xelkê bi mijarê re germ e û referandûma me wê birêve biçe.

Rojavayê Kurdistanê ber bi man û nemanê ye



N: Ebdûlazîz Qasim

Di roja 9ê mijdarê de termên 9 xortên kurd gehîştin Kobanî ku berî mehekê termên 18 kesên li beravên Cezaîrê hatibûn dîtin, ku 14 ji wan ji Rojavayê Kurdistanê bû, di encama binavbûna qayika wan di derya Spî de li peravên Cezaîrê. Hêjayê gotinê ye, ku ev karesat ne ya pêşiyê ye, û helbet heger rewşa Rojavayê Kurdistanê wisa bimîne dê ne ya dawiyê jî be, ku rûdan û karesatên bi vî awayî mîna “Keştiya Tîtanîk” mehane bi serê koçberên kurd diqewmin, û di dawiya meha borî de jî malbatek ji Efrînê di qezayeke keştiyê de li peravên Sûriyê jiyana xwe ji deşt dabû, ku rojane bi sedan welatîyên Kurd ji navçeyên di bin dagîrkeriya Tirkîyê û herwiha di bin kontîrola (PYD) de ber bi Ewropa, Herêma Kurdistanê û welatên cîran ve direvin ji ber rewşa xirab û dijminatîya mîletê kurd û hebûna wî ya neteweyî li navçeyên dagîrkirî ji aliyê Tirkîyê û çeteyên wê ve, herwisa siyaseta û kiryarên şaş yên tene spandin li deverên di bin kontîrola PYD

de.

Îro rewşa Rojavayê Kurdistanê bi tevahî rastî guhertina demografîk dibe û mîletê kurd tê asîmilyonkirin, ku heta radeyekê herdu bajarên Serêkaniyê û Girêspî ji kurdan bi carekê hatine valakirin û rêjaya kurdan berî sala 2011'an li Serêkaniyê zêdetirî 65% bû, ku niha bi tîne 50î kurd bi tîne li Serêkaniyê dijîn, bi heman awayî ku rêjeya kurdan li Herêma Efrînê berî sala 2011'an zêdetirî 95%, ku niha kêmtir ji 30% ye.

Ta radeyekê guhertina demografîk li deverên di bin kontîrola PYD de jî hatiye pêkanîn, bo nemûne ku berî sala 2011'an bi tîne 7-10 malbat Erebi li bajarê Dêrikê hebûn, ku îro zêdetir ji 1200 malbatên Erebi li Dêrikê dijîn zêdebarî Kampa Newroz ya nêzîkî bajarê Dêrikê ku bi hezran Erebi tede dijîn.

Ku piştî civînên Nûnerê Wezaretê Derve ya Amerîka li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Nicholas Granger meha borî ligel “Encûmena Nîştîmanî Kurdî” û partiyên “Rêveberiya Xweser” bo gotûbêjkirina deştîpêkirina gereke nû ya danûstandinan ji bo timamkirina lihevhatina Kurdî-Kurdî, dihat pêşbînîkirin ku li Rojavayê Kurdistanê seqayekê baş peyda bibe bo dubarekirina diyaloga kurdî-kurdî, nemaze piştî peydabûna tîkiliyên bihêz di navbera



rêjîma Sûriyê û Tirkîyê de bi palpiştiya Rûsya û Îranê, ku encamên wê tîkiliyê li ser erdê bi awayekî berçav diyar dibin, nemaze radeştîkirina Efrînê bo Rêxistina Tehrîr El-şam “HTŞ” ya terorîst û zêdebûna oparesyonên leşkerî yên Tirkîyê li dijî serkirdeyên leşkerî û rêveberên PYD-PKK li Rojavayê Kurdistanê.

Herwisa dihat pêşbînîkirin ku hin derfet bo yekrêziyê peyda bibin, piştî lidarxistina 4'emîn kongirê ENKS'ê li Qamişlo di roja 14'ê vê mehê de, lê bi awayekî çavrenekirî ji aliyê hêzên PYD'ê ve rê li pêşîya lidarxistina kongirê ENKS hate girtin, ku ev pêngav wekî ragihandina tîkçûna hemû hewlên berê yên Amerîka-Fransa ji bo pêkanîna lihevhatina Kurdî-Kurdî di navbera PYD û ENKS hat dîtin, tevî sozên PYD'ê ligel Amerîkiyan bo peydanekirina astengiyan li pêşîya lidarxistina kongirê (li gorî daxuyaniya ENKS'ê).

Helbet ku di vê rewşa xirab de, pêdivî heye ku her yek ji PYD û ENKS li siyaseta xwe vegerin ji bo rizgarkirina mîletê Kurd ji çarenivîsek nediyar, ku bi taybetî ji PYD tê xweştin ku bi erekê xwe yê neteweyî rabe ji ber berpirsyaretiya wê, ku îro deştîdariyê li beşa herî mezin li Rojavayê Kurdistanê dike, ji ber ku heger rewşa Rojavayê Kurdistanê wiha bimîne dê baştir nebe ji rewşa kelekên “Qayîk” bêsêrûber yên koçberiyê û mirinê.

Kurdan tim û tim bi hev re jiyîneka hevpar avakirinê wisa jî jiyîne ...



N: Nuran Koyuncu

Tê zanîn ku li gorî mît û baweriyên kevn ji Sumerîyan vir ve heta ola xirîştîyanîyê

navê Lîlîthê di baweriyên wê demê de derbas dibe.

Herweha li gorî bawerîyan Lîlîth beriya Havvayê jin û rêhevala Adem a bihûştî rengîn bûye. Xwedayê mezin û pîroz ji bo rêhevalti û hevserokatiya Adem ew afirandiye. Şêweya afirandina Lîlîthê wek afirandina Adem e. Xwedayê mezin herdu jî wekhev ji axê afirandiye. Lîlîth û Adem rêhevalên hev in bi heman tiştî afirîne lewre li gorî wê jî wekhev in. Ango ji hev ne

zedetir û ne jî kêmtir in. Lê wekhevîbûna wan bi demê re Adem aciz dike.

Adem xwe ji Lîlîthê mezintir dibîne. Dixwaze her tişt li gorî xweştina wî bibe û Lîlîth jê re rêzê bigre. Lê, Lîlîth jî tim doza wekhevîbûnê dike û dibêje em heman tiştî afirîne. Bi demê re tîkiliyên wan yên zayendî jî bi ser de tev xirab dibin. Her dîsa Adem wisa dizane ku Xwedayê mezin Lîlîth tenê ji bo xizmetkarî û rêzgirtina wî



»»»Dom R:9

»»»Doma R:8

afirandiye lewma, ténagihêje çima Lîlîth doza jiyaneka hevpar û wekhevbûnê dike û çima daxwaz û xweşteka xwe û şert û mercên xwe yên derheqa jiyanê derdixîne li pêş wî. Dawiya dawî Lîlîth û Adem li hev nakin. Têkiliyên wan tev xirab dibin. Lîlîth bîryar dide û ji bihûšta rengîn derdikeve diçe li dinyayê. Tê bawerkirin ku şikeftoka di rojhilata nêzik li nêzikî Behra Sor de bi cî û war dibe. Li wê derê jî bi cînan û Samael(şeytîn) re dikeve tēkiliyên zayendî, ji wan gelek zarokên wê çêdibin. Dibe ku rojê bi sedan zarok jê çêdibûn. Vî yalî Adem li bihûstê tenê ye li ber xwe dikeve xema tenêbûnê dikşîne. Sibê heta êvarê ji ber xema tenêbûnê lavayan ji Xwedayê dike ku wî tenê nehêle û Lîlîthê bi şûn de bîne. Li pey lavayên Adem Xwedayê mezin sê firîşteyên xwe yên qasid(Senoy, Samseloy, Semengelof) dişîne li pey Lîlîthê ku ew bi wan re bê û dîsa di bihûšta rengîn de bibe rêhevala Adem. Lê, lîlîth venagere. Ji ber ku Lîlîthê seba azadiya xwe ji firêqetiyê dûr sekiniye li bihûšta rengîn terikandiyê. Herçiqas firîşteyan gefên kuştina zarokên wê ku ew zarok ji şeytîn û cînan pey-dabûne bikin jî ew bi wan re naçe. Firîşteyan ji ber wê gotina xwe dikin ji pey re gelek zarokên wê dikûjin û kuştina wan jî dibe berdêla bîryara wê ya azadiyê. Lîlîthê piştê dê tola kuştina zarokên xwe hilde. Li gorî baweriyên li nav xelkê tola xwe hê jî hildide. Lê, li vir qala tola wê ye neyê kirin.

Gava Lîlîth ku ligel firîşteyan venegere îca Xwedayê mezin bona rêhevaltiya jîyana Adem a bihûšta rengîn bîryara afirîdeyeka jin da. Da ku Adem bextewar bibe, daxwaza wî bê cî. Rojekê dema Adem di xewê de ye Xwedayê mezin bi parsûyekî wî ve Havvayê diafirîne. Havva ji der ve jineke mîna Lîlîthêye, dişibe wê, lê, xiset û kesayetiyê wê ne wek Lîlîthê ye. Ji ber ku Havva serê xwe li ber Adem dîtewîne, wî ji xwe mezintir



dibîne ango jineke li gorî her daxwaza Adem e. Adem wisa tēdigihêje ku ew Lîlîthê edî rêya raştîyê dîtiye mezinbûna Adem dipêjirîne. Tu carî jê şik nake, nayê bîra wî ew jineke din e .

Em vê hişmendiya Adem a li ser Lîlîthê dikarin bişibînin rêbaza dewletên li ser binge-hîna hêza pederşahiye av-abûne. Dewletên pederşahî ku pirriyên dewletên zor-dar yên ku li ser civakê û li ser tevahiya xelkê zextan dikin bi vî awayî xwe rêve dibin. Civakê wek yek ya mêran yek ya jinan dikin du ber.

Jinan jî wek Lîlîthê dibînin û tawanbar dikin û sedemên guherînkariya civakê dibînin û wek şeytîn(ehrîmen)pênase dikin. Hîmê vê hişmendiye bi zagonan ve qewîn dikin, ev dibe rê û rêbazeka zordestan.

Welêt û xelkê bi vê rêbazê bi rê ve dibin. Mixabin roja îroyîn hema hema seranserê cîhanê ev hişmendî kêm û zêde aşkera an veşartî bi kîjan olan bawer bibin wek rêbazeka hêzên dewletan li ser xelkê tê meşandin. Dix-wazin li vê derê bi bîrdoza Psîkanalîz Hanz Joahim Maas ve vê hişmendiye zelal bikin. Maas vê hişmendiye wek”Pirsgireka(komplexa) Lîlîthê”bi nav dike. Li gor wî jin bi hebûna xwe, bi kiryarên xwe bi her aliyê ve azad e, ne

mêr zêdetir e ne jî kêmtir e ango ew wekhev in. Zayendi-ya wê, zarokanîna wê tiştên xwezayî ne. Lewma tawan-bariya wê û gunehkariya wê ne asayî ne reva ye. Herweha dêtîbûn dilrehmî ye, dilovanî, aramî û hemxemî ye.

Ne sedemên kiryarên xirab û pîs in. Pêşniyar dike ku ji bo aramîyê li hev kirina civakê ev taybetiyên dêtîyê bibe hîmê tēkiliyên hemû civakê da ku civak bi hev re bi aşî bijîn. Hişyariyê dide û balê dikişîne ser û dibêje “Heke civak jînê û dêtîyê tawanbar bike û mafên jinan bin pê bike û tu carî rizgar nabin herweha yên ku wisa dibînin jî nexweş in divê bêne pak kirin.” Mixabin bi taybet rejîmên li rojhilata nêzik û navîn wek rejîma li Îranê bi zanetî rêbaza xwe li ser vê hişmendiya xirab avakirine.

Îro destûra li xwe kirina cil û bergan bigire heta heqê jiyanê wan hemû mafên jinan tēn bînpêkirin. He-zkî wek hişmendiya mêt-inkaran bi nav bikî hezkî wek hişmendiya pederşahiye bi nav bikî serwerên dewle-tan naxwazin ne jin ne mêr wekhev bin, azad bin. Diza-nin wekhevbûna jin û mêran, hemû kesan dê bibe dawiya pergala wan. Lê, zexta zorî li ser jinan tê kirin. Niha li Îranê rejîma mollayan 40 salî zêdetir e bi vê hişmendiye ve xwe rêve dibe. Naxwa-

zin niha yeko yek zagonên wan, rêbaza wan bi hûrgilî binirxînin. Dibe ku careke din.

Lê gorî bîrdoza Maas em dikarin bibêjin nexweşên wisa bûne Serwerîya Îranê bi vî halî kedên hemû insanan, xelkan, neteweyan dixwin. Mafên wan bin pê dikin. Rêya azadî û li hev kirina ci-vakê digrin. Armanca rejîma Îranê ya bi vê hişmendiye ew e ku xwedêgiravî dilê mêran bike û li wan bike rêheval û piştgiyên xwe ewqas zextê jî bi vê piştgiyê û zagonan ve li ser jinan bimeşîne. Civakê bédeng bihêle jinan jî tenê. Wekî her kes dizane û dibîne ku vê gavê zêdetir berbiçav e, zexta wan ne tenê li ser jinan e, xeynî çîna oligarşiyê li ser her kesî ye. Mixabin em ê dîsa bi lêv bikin zêdetir li ser kurdan e. Dikûje, bin-çavî dike, direvîne bi darve dike, dixê zîndanên û li wir tehdeyan dike. Her çiqas rejîm xwedêgiravî li gorî şert û mercên îslamê bibêje û bike jî ev hişmendîya ku jinê tawanbar dike, sedemên gunehkariyê dibîne spasdarî ne ku tu carî li nav kurdan cî negirtiye. Ji berê de heta niha kurdan tu carî bi vî çavî jinan neniherîne. Tim û tim bi hev re jiyaneka hevpar avakirine wisa jî jiyyîne. Bingehîna bîr û bawerîya kurdan ne tenê li ser wekhevbûna jinan e li ser wekhevbûna hemû zîndew-eran e; çî jin, çî mêr çî ajal, çî hewa û çî gîya û ... whd.

Bawer û hêviya me ew e ku di pêşerojê de jî wisa bimînin. Di haman demê de dê bibin serkêşên xelkên li Rojhilata nêzik û navîn û li wan jî rizgar bikin.

Ji ber ku kurd neteweyekî bi dehan împaratorî û şariştanî ava kirine. Xwedî çandeka zengîn in; Herçiqas dagirker-an jî vê çandê dizîne û kirine para xwe jî yên mayî dê têra kurdan bike. Ew sedemên serbilindiyê ne. Dê bibe hêza serxwebûnê û azadiyiyê û xwedî dewletbûnê jî.

Bi rêzdarî hemû cangoriyên Kurdiştanê bi bîr tînin. Bi hêviya serkeftina Rojhilat û bi tev de her parçeyên din.

Birîndarkirina welatiyan li ser navê olê



N: Hesên Mukerem

Rejîma Îslamî ev heyama 40 û çend salan e ku li ser navê ola Îslamê li ser xelkê Îranê de hikim dariyê birêve dibe û berdewam şîret û gotinên îmaman bo xelkê behs dikin û ev jî berevajî an jî her bingeha wan şîretan tune, li ser navê Îslamê behsa wekhevî û dilovaniyê dike, lê, her tişt berevajî birêve dibin û wiha hikimdariya xwe radigirin.

Li pirtûka Qurana pîroz de li sûreya Yûnif ayeta 58'an de Xwedayê dilovan dibêje: Mezintirîn nê imeta ku min daye bendeyê xwe dilxweşî ye û hertim dilxweş bin, lê, Komara Îslamî bilî ku ev dilxweşî ji xelkê standiye, di vê heyama temenê byûm yê xwe de bi bidarvekirin û belengaz hiştin û bêparkirina welatiyan ji azadiya mirovî ku mafê her canliberekê ye, dilê wan birîndartir kiriye.

Herwisa Mizgeft, Dêr û Zanko, piştgiya kesayetiyan ayînî, xwendevan û karker'an gelek grîng in. Ji xwe taybetmendiya vê serhildanê jî ew e ku ji hemû kategoriyên civatê pêra ye. Ev yeka gelek grînge ku xwenîşanderan heta niha metodên şiddetê bi kar ne anîn in. Serhildan, bi metodên demokratîk ve birêve diçe. Mizgeft, mala Xwedê ye. Keç û jinên kurd xwe avêtbin mala Xwedê û ji mala Xwedê, ji bo jiyanek demokratîk, azad û yeksan, bi bilindgoyên mizgeftan dengên xwe radigîhînin xelkê, lê, em dibînin ev deşhilata dîktator û dirinde ku li ser nava ola Îslamê hikimdariyê dike, wan herketên han nabîne û bo mana xwe hemû cinayetekê endam dide hetam rehm bi Kiyan

Pîrfelekê temen 10 salî nekir û li Îzê ev elîtê temen kêm şehîd kir. Ev zilm û hovîtiya rejîma kevneperest biqasî ye ku vê carê bi qetila Jînaya xelkê bajarê Seqizê ku li Tehrana paytext mêhvan bû û bi destê hêzên serkutkar û mirovkuj hat qetlîkirin, ev hovîtiya rejîmê weke bombeyeke barûtê teqîya û seranserê Kurdistan û Îranê girt.

Rejîma cinayetkar bi cihê ku vê birîna han çareser bike, bi kuştina xelkê nerazî yên li hember qetla Jîneyê de derkevîne ser şeqaman, çavên xwe girtine û hêzên dirinde yên rejîmê ku ti exlaqek mirovahiyê berçav nagirin, li bajarên Rojhilatê Kurdistanê û bajarên din yên Îranê ji zarokên ku li dibistanan ku bo himbêza dêv û bavê xwe wedigeriyan teqe ji wan kirin û ev qetlî kirin, an li Kerecê keçika nûciwan ya bi navê Nîka Şakeremî ku hunermend bû, piştî deşdirêjiya seksî ev qetlî kirin û bûna peçatîna kiriyarê dîr ji exlaqê mirovahiyê, termê vê li bilindahiya avahiyê havêtin xwarê û di ragihandinên xwe de îlankirin ku vê xwekujî kiriye, ev tenê mînakê ji hovîtiyan wan in.

Rejîma bi nav Îslamî ya Îranê bi şehîdkirina xwenîşanderan ku li hember hovîti û dirindehî û serkutkarî û cinayetên wan serhildane heta niha bi şehîdkirina aliyê kêm 410 xwenîşanderan ku 59 ji wan




zarok in û binçavkirina 16088 keç û xortên serhildêr û deşdirêjiya seksî li ser keçikan di girtîgehên de neku, birînen welatiyên çewsandî û zilm dîtî çareser nekirine belkû birînen wan kûrtir ji berê kiriye û dilxweşiya heyî jî ji wan birîye.

Ji aliyek din ve 227 bi nav nûnerên meclisa bi nav Komara Îslamî ku bi dengê welatiyan hundrî meclîlê bûne, bi cihê ku li hember bêdadiyên hêzên rejîmê de, berevaniyê ji xelkê bê sûç bikin, biryara bidarvekirina wan didin, lê, li ti cihek dinyayê nehatiye dîtin ku nûnerên xelkê dengê bidarvekirina wan bidin.

Herçawan ku Mewlana Ebdulhemîd rêberê olî û pêşnmêjê Zahidanê dibêje: “Hikûmetek ku xelk jê nerazî be derdê tiştêkê naxwe”.

Di dawiyê de, birîn ku manifestasyona tundûtîjiyan e, bi birînan na pêçin belku bi bandagê û pembû dipêçin û bi dilovanî û evîndariyê himbêz dikin, lê, mixabin rejîma Îslamî ku hemû cihan li ser bêdadî û cinayetên wê hatiye yemanê, bi kuştina jin, keç û xortên serhildêr ku bo mafên mirovî yên xwe nerizayetiya xwe anîne ziman, birînen wan biqasî kûr kiriye û bi ti sizayî nayên qerebû kirin.



Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Bokan: Şehryar Mihemedî di pêvajoya xwenîşandanan de bi sebeba teqeya hêzên serkutkar canê xwe ji dest da

Şeva Înê 27`ê Xezelwerê, welatîyê nerazî yê bi navê “Şehryar Mihemedî” yê xelkê bajarê Bokanê di pêvajoya xwenîşandanan de bi sebeba teqeya hêzên serkutkar canê xwe ji dest da.

Termê wî welatîyê Kurd yê nerazî bo nexweşxaneyê “Qûlîpûr” a bajarê Bokanê hatibû veguhaştin û heta niha radeştî malbatê nehatiye kirin.

Pêka zanyariyan, du welatîyên din yên Kurd yên nerazî di pêvajoya xwenîşandananê nerizayetiye de li şeva Înê 27`ê Xezelwerê li bajarê Bokanê bi sebeba teqeya hêzên serkutkar hatine kuştin.

Sine: Ciwanek Kurd di bin îşkenceyê de canê xwe ji dest da

Roja Pêncşemî 26`ê Xezelwerê ciwanê Kurd yê bi navê “Omîd Husêynî” li bajarê Sine ku ji aliyê hêzên serkutkar ve hatibû binçavkirin di nabin îşkenceyê de canê xwe ji dest da.

Pêka gotina çavkaniyek agehdar, piştî xwenîşandananê berfireh yên li bajarê Sine, ev ciwanê Kurd bi lêxistinên tund ji aliyê hêzên serkutkar ve hatibû binçavkirin û bo girtîgeha kelenterî ya 12 ya Fervedîn veguhaştibûn.

Herwisa vê çavkaniya agehdar zêde jî kiriye: Hêzên serkutkar şeva Pêncşemî 26`ê Xezelwerê, “Omîd Husêynî” ku li ser hişê xwe nemabû bo nexweşxaneyê Tohîd ya wî bajarî veguhaştibûn û wir canê xwe ji dest dabû.

Vê çavkaniya agehdar gotiye: Husêynî bi sebeba îşkenceyên tund yên bi batoman canê xwe ji dest daye.

Termê “Omîd Husêynî” şeva Înê 27`ê Xezelwerê bi amadebûna malbata wî li goriştana “Bihûşt a Mihemedî” ya Sine bi axê hatiye spartin.

Omîd Husêynî xelkê gundê “Payîgilan” a ser bi bajarê Servavayê bû.

Bokan: Sê welatîyên nerazî yên din bi sebeba teqeya raşteraşt ya hêzên serkutkar canê xwe ji dest dan

Sê welatîyên Kurd yên bi navên “Mîstefa Şe`ibanî”, “Mîlad Me`irûfî” û “Saman Qadîrbêgî” di pêvajoya nerizayetiyan bajarê Bokanê de bi sebeba teqeya raşteraşt ya hêzên serkutkar canê xwe ji dest dan.

Roja Înê 27`ê Xezelwerê, Mîlad Me`irûfî, temen 23`ê salî ku roja Pêncşemî 26`ê Xezelwerê di pêvajoya nerizayetiyan de bi di-jwarî birîndar bibû, di nexweşxaneyê de canê xwe ji dest da.

Herwisa merasima biaxspartina Mîlad Me`irûfî, bi amadebûna xelkek zêde û bi dana silogana “Ey şehîdan” û siloganên nerazîbûnê li goriştana “Koştê” a wî bajarî hat lidarxistin.

Roja Pêncşemî 26`ê Xezelwerê, Mîstefa Şe`ibanî bi teqeya raşteraşt ya hêzên serkutkar di pêvajoya nerizayetiyan de canê xwe ji dest dabû, mixabin navbirî kêm endam jî bûye.

Herwisa şeva Sêşemî 24`ê Xezelwerê, Saman Qadîrbêgî temen 33`ê salî û kurê Ebdulkerîm bi sebeba teqeya raserast ya hêzên serkutkar canê xwe ji dest dabû û hêzên serkutkar termê wî bo bajarê Urmiyê veguhaştibûn.

Her di vê pêwendiyê de, hêzên ewlehî givaş xistibûn ser malbata wî welatîyê Kurd ku dibe sebeba mirina kurê xwe “xwekuji” rabigihînin.

Saman Qadîrbêgî xîzandar e û xwediyê du zarokan e.

Berê jî, Saman Qadîrbêgî di pêvajoya nerizayetiyan bajarê Bokanê de bi sebeba teqeya hêzên serkutkar birîndar bibû.

Pîranşar: Emîr Ferasetî Şad bi sebeba teqeya hêzên serkutkar hat kuştin

Roja Înê 27`ê Xezelwerê welatîyê bi navê “Emîr Ferasetî Şad” yê xelkê bajarê Pîranşarê bi sebeba teqeya hêzên serkutkar canê xwe ji dest da.

Pêka gotina çavkanyiek agehdar, demjmêr 6`ê êvarê, hêzên serkutkar li kemerbendiya Pîranşarê ev welatîyê Kurd bi golleyên şerî kirine armanc.

Herwisa vê çavkaniya agehdar zêde jî kiriye ku: 4 welatîyên nerazî di pêvajoya nerizayetiyan îro de bi sebeba teqeya hêzên serkutkar hatine birîndarkirin.

Termê Emîr Ferasetî Şad, li nexweşxaneyê Pîranşarê radeştî malbata wî hatiye kirin.

Merasima biaxspartina wî welatîyê Kurd bi amadebûna xelkek zêde û dana silogana “Şehîd namirin”, hat lidarxistin.

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (434)

Wêneyên xwenîşandanên serhildana seranserî li Kurdistan û Îranê

